Stadt Bern

AHV-Zweigstelle
Bern-Ostermundigen

# Sûdên temamker (EL) zêdeyî AHV û IV

***Sûdên temamker çi ne?***
Sûdên temamker li Swîsê pêkhateyeke girîng a sîgorteya civakî ye. Eger hûn li gorî qanûnê xwedan merc bin, mafê we yê qanûnî heye ku van sûdan wergirin, bi heman awayî ku we mafê qanûnî yê teqawidbûna AHV an IV heye.

***Kî dikarin ji sûdên temamker wergirin?***
Kesên ku alîkariyên AHV an IV werdigirin ku teqawîdan û dahata wan di bin asta debara civakî de ye, xwedî mafê alîkariyên lêzêdeker in.

Kesên sûdên AHV yan IV werdigirin û teqawidbûn û derhata wan jêr asta yarmetiya civakî ye dikarin sûdên temamker wergirin.
Kêmtirîna yarmetiya civakî bi rêgezên cuda yên hesabkirina qanûnî tê destnîşankirin. Eger hûn dixwazin bizanin gelo we maf heye ku sûdên temamker wergirin yan na, hûn dikarin qaîdeya hêsan a bûdceya mehane ya jêrîn bi kar bînin:

Dahata giştî
- Diravê sîgorteya tenduristiyê
- Kirê
--------------------------------
= Dahata zelal
===================

Eger dahata zelal ji bo kesên nezewicî mehê ji 1’722 frankan û ji bo kesên zewicî ji 2’583 frankan di mehê de kêmtir be, tê pêşniyarkirin ku hûn di derbarê mafê xwe yê muhtemel bo wergirtina sûdên temamker daxwaza zelalkirinê bikin. Ji bo malbatên xwedî zarok, mîqdarên jorîn bo her zarokekê 300 – 901 frank zêde dibin.

Eger kesek li penaberiyê dijî, pîvanên din tên bicîhkirin. Nivîsgeha şaxa AHV ya Bern-Ostermundigen amade ye ku li ser vê yekê zanyariyan bide.

***Bandora dewlemendiyê çi ye?***
Ji sala 2021ê pê ve, qaseke dewlemendiyê hatiye destnîşankirin. Kesên ku ji 100,000 CHF zêdetir diravdar in, nikarin sûdên temamker werbigirin. Ji bo kesên zewicî, ast 200,000 frank e.

Dahata (mînak faîza ji hesabê zexîreyê) ji hemî hebûnên din li dahatên din tê zêdekirin.

Kesên nezewicî dikarin 30,000 CHF û kesên zewicî 50,000 CHF ji sermayeyên xwe kêm bikin. Ji bo malbatên xwedî zarok, kêmkirina sermiyana destûrdar ji bo her zarokekê 15,000 CHF zêde dibe. Wekî qaîdeyekê, 10% ji qasa mayî tê girtin. Ev qas di hesabê EL de (ji bo budceya mehane 1/12 wê) wekî dahata zêde tê hesibandin.

Malhebûneke ku ji hêla xwedanê xwe ve tê bikaranîn tenê eger nirxa wê (fermî) ji 112,500 CHF derbas bibe, di nav hebûnên din de yekê hesibandin.

***Gelo pêdivî ye ku sûdên temamker werin paş vegerandin?***
Piştî ku venêrîna EL ji sala 2021ê vir ve were sepandin, pêdivî ye ku sûdên temamker ên ku kesekî di deh salên dawîn de berî mirina xwe wergirtiye ji malhebûna wî yan wê were paşvegerandin. Li ser kesên zewicî, dirav dê tenê piştî mirina hevjîna duyem be. Li ser mîrasê 40,000 CHF miafiyet destûrdar e.

***Kî serlêdanên EL qebûl dike?***
Nivîsgeha şaxa AHV ya cihê rûniştina we serlêdanên EL qebûl dike. Li bajarê Bernê, ev nivîsgeh li Bundesgasse 33 ye.

***Eger pirsên min ên din hebin kî bersiv dide?***
Meaşwergirên ku li bajarê Bernê yan jî li şaredariya Ostermundigen dijîn, dikarin bi nivîsgeha şaxa AHV ya jêrîn re têkilî dayînin. Karmend amade ne ku bersiv bidin pirsên li ser sûdên temamker û ji we re dibe alîkar ku hûn serlêdana sûdên temamker bikin.


**AHV-Zweigstelle Bern-Ostermundigen**
**Bundesgasse 33**
**3011 Bern**

Tel. 031 321 61 61
E-name:ahv@bern.ch


***Gelo hûn dixwazin li ser sûdên temamker bêtir bizanin?***

Nivîsgeha şaxa AHV li Bern-Ostermundigen bi rêkûpêk civînên agahdarkirinê li dar dixe. Di derbarê xalên herî girîng ên sûdên temamker de agahdarî jizanyariyan didin beşdaran û herwiha fêr dibin ka bajar ji bo qonaxa piştî kar çi karûbaran pêşkêş dike. Ev derfeteke baş e ku meriv pirsan bipirse yan jî ji şêwirmendiyeke kurt sûd werbigire.

Zanyarî li vir hatine weşandin: www.bern.ch/ahv

Januar 2025